Barnskyddsteam
Region Skåne

*Kurmanji*

AGEHÎ BO DÊÛBAVAN:

# Ragihandina Endîşeyê bo Sosyal'ê (Xizmeta Civakî)

# Ragihandina Endîşeyê bo Sosyal'ê (Xizmeta Civakî)

Heger personelên li sektora lênihêrîna tenduristiyê guman bikin ku rewşa zarokekî nebaş e û yan zarok û malbata wî pêwîstî bi alîkarî û piştgiriya Sosyal'ê heye, personelên lênihêrînê li gorî Qanûna Sosyal'ê (Socialtjänstlagen) beşê 19, benda 1, mecbûr in ku yekser vê metirsiyê (oros-anmälan) ragihînin Sosyal'ê Armanca ragihandina metirsiyê bo Sosyal'ê ew e ku bê zanîn gelo wekî dêûbav an welî (vårdnadshavare) pêwîstî bi piştgirî û alîkariyê li warê dêûbavtiya wan heye yan na.

Raporek (anmälan) bo Sosyal'ê her tim li ser bingeha metirsiya li ser zarokî ye.

Raporkirin dikare ji ber vê yekê be ku mirov bi endîşe be ku tiştên pêwîst bo zarokî nayê kirin, mînak ber zehmetiyên dêûbav bi xwe, kêmasiyên li warê çavdêrî û lênihêrînê, kêmasiyên li warê xwarin, paqijî, dermanxwarin û diranan, an jî heger ku zarok tûşî destdirêjiya derûnî yan fîzîkî (lêdan) an tecawizên zayendî bûbe.

Bêyî ku raportek hatibe çêkirin an nehatibe çêkirin, mafê zaroka we û mafê we heye ku hûn lênihêrîneke baş û pêşwaziyeke baş bibînin.

Li nava lênihêrîna tenduristiyê ya li Region Skåne (Herêma Skåne) kurator (rehber) hene ku dikarin bibin piştgiriyeke baş heger hûn meraq bikin ka dê çi biqewime dema ku ji Sosyal'ê re tê raporkirin. Ji personelên mottagningen (beşê nexweşxaneyê) bixwaze ku alîkariya te bikin da ku tu bi rehber re bikevî têkiliyê.

Heger raporkirin li dema lênihêrîna zarokî çêbibe, karmendên lênihêrînê berpirsiyarê dermankirina bijîşkî û lênihêrîna zarokî ne, Sosyal jî berpirsiyarê, lêpirsîna xwe ye  Heger lêkolînên bijîşkî metirsiya li ser wê yekê ku zarok hatibe îhmalkirin an zirar gihîştibe zarokî piştrast nekin, ev yek dê di rojnameya bijîşkî (journal) de cih bigire û her wiha ji Sosyal'ê re bê ragihandin.

Heger raporkirin li dema ku hûn wekî salmezin nexweş in û karmendan fêhm kirine ku hûn û zarokên we pêwîstî bi piştgiriyê heye, lênihêrîna we wekî berê berdewam dike. Sosyal ji bo civîneke destpêkî dê bi we û malbata we re bikeve têkiliyê, û paşê dê biryar bê dayîn ka pêwîst e ku rewşa zarokî bê lêpirsîn û kîjan tedbîr gerek dikin. Mafê we û zarokên we jî heye ku hûn agahî, şîret û piştgirî ji personelên lênihêrînê yên ku li ciyê hûn lê têne dermankirin, bistînin.

# Ji Socialtjänstlagen (Qanûna Xizmeta Civakî); Beş 19, Xala 1:

*Dezgehên (Myndigheter) ku xebata wan bandorê li ser zarok û ciwanan dike, û her wiha dezgehên din ên di warê lênihêrîna tenduristî û Qanûna Xizmeta Civakî de, bêgav in heger ku di xebata xwe de haya wan jê çêbibe yan guman dikin ku zarokek di rewşeke xirab de ye, divê yekser ragehînin bo Sosyal'ê rapor bikin.*

# Çi li dema raporkirinê diqewime?

Li ew devera ku zarok lê dimîne, bi Sosyal'ê re peywendî tê kirin.

Sosyal her tim hewlê dide da ku, heta gengaz be, lêpirsîna xwe bi hevkariya zarokî û malbata zarokî re bike.

Sosyal her tim hewlê dide da ku, heta gengaz be, lêpirsîna xwe bi hevkariya zarokî û malbata zarokî re bike. Li wir biryar tê dayîn ka gelo Sosyal dê lêpirsîn bike ku ka rewşa zarokî çawa ye . Carinan kesê ku gilî kiriye beşdarî civînê dibe.

Heger zarok an dêûbav li nexweşxaneyê hatibin razandin, carinan destpêşxerê karê wan ê Sosyal'ê tê nexweşxaneyê da ku bi we re wekî weliyê zarokî re têkilî dayne û agahiyê ji bijîşk û personelê bistîne.

Heger Sosyal lêpirsînekê bide destpêkirin, ew pirî caran bi ciyên din re, mînak bi BVC (Navenda Tenduristiyê ya Zarokan), pêşdibistanê û dibistanê re peywendî datînin da ku wêneyekî giştî bi dest bixin.

Di rewşa pêwîst de, Sosyal civîneke hevrêziyê  bi dezgehên têkildar re li dar dixe.

Lêpirsînek ku herî zêde çar meh dikişîne. Di lêpirsînê de tê gihîştina wê encamê ku kîjan alîkarî û piştgirî ji bo zarok û malbata wî pêwîst e û/an gelo zarok pêwîstî bi parastinê heye yan na. Encama lêpirsînê ji bo lênihêrîna tendurustiyê tê ragihandin, heger weliyê zarokî destûra bo vê yekê bide.